# xema min
# reqs e

**Piştgir û Birêvebirên Projeyê**
Projeya HEP BERABERê (HEMÛ BI HEV RE), bi hevkarîya Anadolu Kültür û Landesweiten Koordinierungsstelle Kommunale Integrationszentrenê (LaKI) û piştgirîya Stiftung Mercatorê, di navbera salên 2017-2019an da pêk hatîye.

## NAVEROK


- Derheqê Projeyê da | 4
- Beşa I: Xema Min Reqs e Çi ye? | 7
- Beşa II: Çarçoveya Bernameya Xema Min Reqs e | 10
- Beşa III: Rêzeçalakîyên Xema Min Reqs e | 15
    - Çalakî 1: Fam Bike | 15
    - Çalakî 2: Tecribe Bike | 19
    - Çalakî 3: Bifikire | 22
    - Çalakî 4: Ava Bike | 25
    - Çalakî 5: Parve Bike | 29
- Pêşnîyazên Tetbîqkirinê | 31
- Pêvek | 36
- Kunye / Credits | 48

## DERHEQÊ PROJEYÊ DA

**ÎNÎSÎYATÎFA HEVKARÎYA ELMANYA-TIRKÎYEYÊ DI WARÊ PIŞTGIRÎYA PENABERAN DA**
**ALL TOGETHER / HEP BERABER / ALLE ZUSAMMEN / HEMÛ BI HEV RE**

Înîsîyatîfa me li Tirkîye û Elmanyayê bi wê armancê derketîye holê ku bikare pêk ve bifikire li ser rêbazên kartêker yên avakirina civakîbûneka giştgir û wasiteyên pratîk yên alternatîf yên bi lihevkirina civakî ra guncandî dabîn bike li hemû warên ku zarok û ciwanên penaber û ne-penaber, yên xwedî rabihurîyên cuda yên sosyo-kultûrî, -bi taybetî li dibistanan- pêk ve lê dijîn.

Bi hêza ku me ji hevkarîya nêzîk ya Tirkîye û Elmanyayê ya xwedî rabihurîyeka kevin di vê mijarê da û ji fehma wan ya ji-hev-fêrbûnê wergirtîye, me bi du pirsên hevpar yên serekî da rêyê:

1. Ji bo em zarokên xwedî rabihurîyeka koçberîyê bi lez tev li jîyana civakî û perwerdeyî bikin û wan teşwîq bikin ku bibin beşdarên aktîftir, em dikarin çi cure materyalên fêrbûnê yên giştgir yên li gor pêdivîyên berbiçav yên meydanê bi pêş ve bixin?
2. Ji bo ku lihevkirina civakî wek qonaxeka dualî saz bibe û tevkarî lê bihê kirin, em çawa dikarin pêk ve naverokên xwedî navendeka kultûrî û hûnerî çêbikin ku armanca wan bikaranîna hevbeş ya hemû zarok û ciwanan be.

Di nav qonaxa du salan da, me zêdetirî 40 pisporî ji du welatan anîn cem hev û li ser van pirsiyaran em HEMÛ PÊK VE fikirîn.

**Beşdarên Me yên Projeyê**
Projeyê, komeka esasî ya xwedî gelek perwerdekar û aktorên civaka sîvîl çêkir û li derdora vê peywendîyeka xurt û berfireh danî. Perwerdeker, pisporên xizmeta civakî, mamosta, akademîsyen, pisporên perwerdeya ne-formel, psîkolog, perwerdekarên dramaya afirîner, pedagogên muzeyê, terapîstên hûnerê, muzîsyen û lêkoler yên ji Tirkîye û Elmanyayê hatin cem hev.

**Komên Me yên Xebatê**
Bi wesîleya civanên me yên di çarçoveya projeyê da, beşdarên me derfet peyda kirin ku mînakên baş yên di warê xwe da nîşanî hev bidin, pêk ve çavderîyê bikin li ziyaretên meydanî yên cuda û ji hevûdin fêr bibin. Li gor warên pisporî û eleqeyê, 6 komên xebatê yên tematîk peyda bûn.

Van komên xebatê fikirên xwedî navendeka perwerdeya kultûrî û pêşnîyazên çareserîya hevpar bi pêş da birin ku piştgirîya “pêk vejîyan”ê xala serekî bû. Wan ev fikirên hevpar yên bikaranîna aktîf ya îfadeya hûnerî wekî muzîk, hûnerên performansê, resim, peyker, lîstik, dramaya afirîner, edebîyat, dansê, tevî miqatebûna li pêdivîyên babetên cuda, veguherandin berhemên şênber, amûrên perwerdeya alternatîf.

**Berhemên Projeya Me**

Berhemên ku piştî projeya HEMÛ PÊK VEyê derketine holê,

- nêzîktêdaneka rêxweşker bo fêrbûna giştgir qebûl dike û armanca wê tevlêkirina hemû zarokên penaber û ne-penaber e.
- alîkarî dike ku pirzimanî û cihêrengîya kultûrî wekî nirx û zengînîyekê bihê qebûlkirin û balê dikêşe ser hêza “perwerdeya ne-formel” ya di vî warî da.
- wasiteyên fêrbûna bi lîstikan destekkirî, yên afirînerîyê, yên bihêzkirina qabîlîyetên îfadeya şexsî û kolektîf û yên fêrbûna bi hemsalan destekkirî pêşkêş dike, bi vê wesîleyê kultûra pêk vejîyanê di nav zarok û ciwanan da xurt dike.
- bixwebawerîya zarokên xwedî jîyaneka penaberî û koçberî xurt dike, nahêle ku di pêvajoya hînbûna derdora nû ya jîyanê ra ji mîrateyên xwe yên kultûrî biqetin, û tevî parastina peywendîyên bi mîrateyê ra, qadên nû vedike ji bo sazkirina peywendîyên nû.
- piştgirî dike ku zarok hem zimanên xwe yên malbatê hem jî zimanê civaka tê da fêr bibin; gava ku vê dike, nêzîktêdanên nûxwaz yên perwerdeyê bi kar diîne bi rêya kultûr, hûner û lîstikê.

Her komeka xebatê berhemeka hazir bo pratîka li meydanê pêk anî ku dibin mînak ji van prensîban ra. Berhemeke ji van jî BERNAMEYA XEMA MIN REQS E ye ku niha rêbernameya wê di destê we da ye.

Hûn dikarin di ser navnîşana www.hep-beraber.orgê ra bigihîjin hemû berhemên projeyê.



## BEŞA I: XEMA MIN REQS E ÇI YE?

**Xema Min Reqs e Çi ye?**

Xema Min Reqs e, bernameyeka perwerdehîyê ya ne-formel e ku xwe dispêre fêrbûna bingeh-vîdeoyî û bi wasiteya çalakîyên alîkar yên di nav sinifê (yan jî cihekî din yê fêrbûnê) da, beşdaran teşwîq dike ku li ser mîrateya xwe ya kultûrî ya pirhêl bifikirin, bi hevûdin ra bireqisin û ji hevûdin fêr bibin.

**Kî û Kî Beşdarî Bernameya Xema Min Reqs e Dibe?**

Xema Min Reqs e wekî bernameyeka çalakîya komî, ji komên herî kêm 6 kesî pêk dihê û bi zarok yan jî ciwanên herî kêm 12 salî ra dikare pêk bihê. Bername ji bo ciwanên ji derdorên sosyokultûrî yên cihêreng û xwedî yan jî ne-xwedî tecribeyên koçberîyê hatîye sêwirandin da ku bikarin pêk ve bi kar biînin. Di temamê kitêbokê da dê wekî "beşdar" behsa sûdewergirên Bernameya Xema Min Reqs e bihê kirin.

**Kî û Kî Bernameya Xema Min Reqs e Pêk Diîne?**

Mamosta, perwerdekar, pedagog, pisporê xizmeta civakî, psîkolog û dilxwazên bi ciwanan ra kar dikin, dikarin bi vê bernameyê ra bixebitin. Ji bo pêkanîna bernameya Xema Min Reqs e hewceyî tu pisporîyeka reqsê nake. Bername, xwe dispêre vîdeoyên perwerdehîyê. Hêsanker, ew kes e ku tev li tecribeyên fêrbûn û parvekirinê dibe û di demên hewce da vê pêvajoyê hêsan dike. Di temamê kitêbokê da dê kesên birêvebir yên çalakîyê wekî "Hêsanker" bihên binavkirin.

**Rola Hêsankeran ya di Bernameya Xema Min Reqs e da Çi ye?**

Hêsanker, bi awayekî aktîf beşdarî pêvajoya fêrbûna reqsê ya komê dibin. Rola hêsankeran her weha ew e ku beşdaran teşwîqî axaftinê, parvekirina zanîn û tecribeyan ya bi komê ra bike, û bi birêvebirina peywendîyê ra alîkarîya çêbûna qadeka baş ya nîqaşê bike. Girîng e ku hêsanker bi awayekî aktîf û hevseng pêvajoyê bi rê ve bibin da ku beşdar bikarin dilxwaz bin di xwe-îfadekirinê û axaftinê da.

**Xema Min Reqs e li Kû û Çawa Dihê Bikaranîn?**

Xema Min Reqs e, çêdibe ku li dibistanan, li navendên civakî, li navendên ciwanîyê û li yên wekî van qadên fêrbûnê yên formel û ne-formel bihê bikaranîn. Ji bo tetbîqkirinê qadeka ku mi-

---

[1] Di vê kitêbokê da îfadeya "tecribeya koçberîyê", tecribeyên koçberîya navxweyî û derveyî, koçberîya karî, koçberîya mecbûrî, îltica û penahê yên di demên cuda da digire nav xwe.

rov bikare bi komî lê bireqise û ekîpmaneka ku bikare di ekraneka mezin da vîdeoyê bidomîne bes e. Her çalakîyek 25-50 deqîqe didome. Bernameya xwedî 5 çalakîyan, di nav rojekê da pêk ve jî dikare bihê pêkanîn û di maweya hefte yan mehan da jî dikare bihê pêkanîn. Bernameya Xema Min Reqs e wekî parçeyekî mufretdata dibistanê, xebatên piştgirîyê yên psîkososyal, hevdîtinên navendên civakî û çalakîya zarokan yan jî ciwanan çêdibe ku bi bi wesîleyên cuda bihê pêkanîn.

## AWAYÊ BERNAMEYÊ ÇAWA YE?

Xema Min Reqs e bi awayê pênc çalakîyan pêk dihê. Her çalakîyek bi wî awayî hatîye sêwirandin ku ji cihê mayî yê çalakîya berî xwe didomîne. Çalakî bi awayê serekî wisa didomin:


**Çalakîya 1:** Beşdar, bi wasiteyeka vîdeoyê "dilxwazekî reqsê" nas dike. Ev kes kesekî rasteqîn e ku piranî ji bo keyfê direqise, reqseka di vîdeoyê da ji bo temaşekeran qal dike û reqsa berbehs wekî parçeyekî çêkerîya xwe dihesibîne. Di vê çalakîya ewil da ji komê dihê xwestin ku "dilxwazê reqsê" nas bike, agahîyên di vîdeoyê da fam bike, li ser bifikire ka reqsa berbehs yan jî reqskirin bi awayekî giştî ji bo vî kesî çi îfade dike.

**Çalakîya 2:** Di çalakîya duyem da vîdeoya perwerdehîya reqsê dihê vekirin. Heman dilxwazê reqsê, vê carê jî gavên reqsan yên di vîdoyê da behs kirî dide fêrkirin. Di vê çalakîyê da beşdar direqisin û li ser difikirin ka tecribeya reqskirinê çi faydeyê bo mirovan bi dest diîne. Kom, di vê çalakîya duyem da baştir fam dike ka reqs çi tiştan bi dilxwazê reqsê dide hîskirin.

**Çalakîya 3:** Beşdar di çalakîya sêyem da milaqatekê bi hevûdin ra pêk diînin û behsa tecribeyên nêzî hev yên muhîm ji bo xwe dikin. Bi vî awayî, beşdar dihên teşwîqkirin ku li hafizeyên xwe yên bedenî hûr bibin û bifikirin ku ka tecribeyên wisa xwedî pareka çawa ye di avabûna sûbjektîvîteyên wan da.

**Çalakîya 4:** Di vê çalakîyê da, beşdar tecribeyên xwe yên di milaqatê da behs kirî bi awayekî dîmenî îfade dikin. Beşdar di wê gavê da dihên vexwendin bo xêzkirina (îfadekirina) vê tecribeya di hişê xwe da ya bi wasiteyên cudatir.

**Çalakîya 5.:** Di çalakîya dawî da berhemên çalakîya berî wê dihên parvekirin. Beşdar vê carê, tecribeyên xwe yên di çalakîya dawî da bi awayekî dîmenî îfade kirî bi peyvan qal dikin, pêşkêşîyên hevûdin guhdar dikin û bi awayê şexsî yan jî komî direqisin. Her weha kom derheqê tecribeyên xwe yên Bernameya Xema Min Reqs e da nirxandinekê dikin.


1. FAM BIKE
Xebitîna li dor têgeha çêkerîyê. Hevnasîna bi “Dilxwazê Reqsê” ra bi rêya vîdeo-çîrokan. Xebat û nîqaşa dilxwazî ya li ser vegotina eleqedarî reqsê.
2. TECRIBE BIKE
Temaşekirina vîdeoya perwerdehîyê, fêrbûna gavên reqsê. Îcrakirina reqsê bi awayê komî û nîqaşa li ser wê. Tecribekirina reqsê wekî awayekî çêkirinê û mînaka çêkerîyê.
3. BIFIKIRE
Çêkirina milaqatê. Fikirîna li ser hafizeya xwe ya bedenî ya eleqedarî reqsekê yan jî stranê. Lêkolîna tecribeyên li dor hafizeya bedenî û sehekî dirûv girtine.
4. AVA BIKE
Çêkirina berhema xwe ya afirîner ya derheqê reqs yan jî stranê da. Pêkanîna xebatên hûnera dîmenî û karê destî bi veguhestina hafizeya bedenî û sehekî ya bo mecrayeka din.
5. PARVE BIKE
Parvekirina navbera kesan: Pêşkêşkirina berhemên dîmenî bo hevûdin û fêrkirina gavan bo hevûdin ji reqsên ku wan bi xwe bijartine. Her kes dibe/dikare bibe “dilxwazê reqsê”.

## BEŞA II: ÇARÇOVEYA BERNAMEYA XEMA MIN REQS E

### Armanca Xema Min Reqs e:

Xema Min Reqs e, qadeka vekirî dabîn dike ji bo beşdarên xwedî û ne-xwedî rabihurîyeka koçberîyê da ku mîrateyên xwe yên kultûrî, bîranînên xwe yên aîdî rabihurîyên sosyokultûrî û çîrokên xwe yên şexsî lê parve bikin, gava vê yekê bikin jî li ser çîrokên şexsî û civakî bifikirin, guhdarî bikin, fêr bibin û nîqaş bikin. Bi vî awayî Bernameya Xema Min Reqs e, beşdarên xwe han dide ku bi awayekî çalak bifikirin, hereket bikin, bireqisin, sûbjektîvîteyên xwe yên afirîner derxin holê (bi pêş da bibin) û bi awayekî serekî alîkarîya reqsê çêkerîyên xwe bide destpêkirin.

Di çarçoveya bernameyê da, mirovekî rasteqîn bi rêya vîdeoyê bo sinifê dihê vexwendin. Em dibêjin “Dilxwazê Reqsê” ji bo van kesên ku car caran ji bo keyfê yan jî ji ber parçeyekî jîyana xwe ya rojane direqisin û di merhaleyên cuda yên jîyana xwe da vê reqsa berbehs ji ber sedemên cuda didomînin. Di vîdeoyan da, Dilxwazên Reqsê qal dikin bê ka reqsek xwedî tesîreka çawa ye li ser çêkerîya wan û çîrokên wan yên şexsî bi xwe, û serçimkên bedenî û gotinî bi hereketan dide.

Bi saya vîdeoyan beşdar bi rewşeka ji rewşên curbicur yên çêkerîyê ra rûbirû dimîne: Mînakeka wê dibînin bê ka îrade û zanîna mirovan noqî jîyana wan dikin çawa li awayên cuda yên reqsê dinixumin.

Di merhaleya ewil da bi wê vegotinê ra rûbirû dimînin ku “Dilxwazê Reqsê” derheqê hafizeya xwe ya fîzîkî ya di reqsê da saz kirîye. Di merhaleya duyem da, kom bo şênberkirina hafizeya “Dilxwazê Reqsê” û îcrakirina reqsa berbehs ya bi wî ra dihê vexwendin; bi vî awayî beşdar bi bîranîna “Dilxwazê Reqsê” ra peywendîyek dadinin. Di merhaleyên sêyem, çarem û pêncem da, her kesê di komê da li ser tecribeyên xwe, hafizeyên xwe yên bedenî û bîranînên xwe difikire û li ser wan yên nû ava dike.

Sûdewergirên bernameyê di vê xebatê da ne pasîf in, beşdar bi guhdarkirin yan jî temaşekirinê nagihijin agahîyê. Li şûna vê, ji beşdaran dihê xwestin ku analîzeka rexneyî li kesê di vîdeoyê da û vegotina saz kirî bikin. Dihê xwestin ku li ser wan fikiran baş bifikirin ka ev kes hafizeya xwe ya bedenî û sehekî çawa hildigire, çawa hereket dike û yên nû çawa ava dike. Ji vê xalê û pê da beşdar li çîrok, reqs, hereket û bîranînên sehekî yên jîyana xwe difikirin û peyda dikin û van bi hevûdin ra parve dikin. Bi gotineka din, ji beşdaran dihê xwestin wê tecribeyê nîşan bidin ya

ku alîkar e di sazkirina çêkerîya “Dilxwazê Reqsê” bi xwe da û ew dihên teşwîqkirin ku li ser hûr bibin bê ka dê hêmanên ji nav jîyana xwe çawa di avakirina çêkerîya xwe da bi kar biîinin.

### Têgehên Serekî yên Bernameyê

- **Çêkerî** [2]

Çêkerî, çêdibe ku wekî melekeya hereketkirinê bihê pênasekirin. Çêkerî rewş û kapasîteya hereketkirin yan jî bikaranîna hêza xwe ya serekî ye. Çêkerî ji pêkhateyên cuda yên wekî kapasîte, subjektîvîte, dem û şertê cihê çêdibe. Lîteratûra zanistên civakî derheqê têgehê da, îspat dike ku kesek qudreta desthilanînê ya bi awayên civakî yên “amade” yan jî “qebûlbûyî” ra guncandî, li dij wan yan jî li derveyê wan di xwe da dihewîne. Ev qudreta desthilanînê, li gor sedemên cuda yên girêdayî besatîyên ku kesî di xwe da dîtî û firsendên di jîyana xwe da dîtî dikare bihê tevgerandin. Derdor/awayê civakî, dîyarkereka xurt e di dirûvgirtina curbicurîya fealîyetê da ku kes lê bikare dest bi karî bike. Her weha, şîyana avakirina xwebûnîya ku mirovî di xwe da dîtî û kapasîteya wî ya afirînerîyê jî dîyarkereka dîtir e. Armanca Xema Min Reqs e ew e ku zarok û ciwanan sewq bike da li ser mîrateyên xwe yên kultûrî bifikirin, qîmetê bidin tecribeyên xwe yên ku di vê navberê ra mirovên nû nas kirine, îdraqa xwe ya çêkerîyê berfirehtir bikin û derheqê jîyana xwe da dest bi karî bikin. Xema Min Reqs e gava ku vê dike, wan rêyên teşwîqker dadine holê yên ku qîmetê dide tecribeyên jîyanî yên kirin û helwestên mirovan dîyar dike. .

- **Hafizeya Bedenî**

Hafizeya bedenî, her wekî awayê ku di vê bernameyê da hatîye bikaranîn, hafizeyeka sehekî ye ku li laşê me qeydkirî ye. Rêzekêlîyeka ji alîyê sehekên me ve hatî qeydkirin, hafizeya hest yan jî kiryareka bedenî ye. Ev tecribeyên jîyanî yên hêjayî qedirdayînê ne û esasên kesayetîya mirovî ne. Ser meseleyê, hereketên bedenî yên dema reqskirinê di kêlîyeka dîyar da li cihekî dîyar çêdibin û hestên dihên hîskirin yan jî bîranîna xwarina xwarineka dîyar û bêhna wê xwarinê, bîranîna gotina

---

[2] Peyva çêkerîyê ya di vê kitêbê da ji bo agency ya têgeha îngilîzîyê hatîye bikaranîn. Peyva agencyê di lîteratûra zanistên civakî da her weha maneya peyv û qalibên wekî bikerî, şîyana kirinê, karîn, hêza çêkirinê dide.

stranan yan jî lîstina lîstikekê bi hevalan ra ew bîranîn in ku hafizeya bedenî ava dikin û di çarçoveya Xema Min Reqs e da dê behsa wan bihê kirin.

### Rêbazên Serekî yên Bernameyê

- **Reqs Wekî Wasiteyeka Fêrbûnê**

Reqs, bo nimûne reqsên gelan tevkarîyê dikin di pêkhatina nasnameyên mirovan da, hayjêbûnê dibexşîne û dikare rê li ber veke ku aîdî navendeka civakî be yan jî jê cuda be. Di reqsan da, hereketên sembolîk yên girêdayî bawerî, nirx û qayîdeyên kultûrekê jî hene. Kesê ku reqsê wekî wasiteya fêrbûneka pir-sehekî tecribe kirî, li hafizeya xwe ya bedenî vedigere êdî, dikare hereketên nû tev li vê hafizeyê bike û di sazkirina awayên nû yên îfadeyê da dikare bibe xwedî agahî derheqên yên kesên din da. Reqs bi xwe, hêza dest bi kar kirinê ye, awayekî tecesimkirina kiryarîya kesekî bi xwe ye.

- **Fikirîna Rexneyî**

Fikirîna rexneyî ya ku bikaranîneka bi disîplîn ya melekeyên zihnî divê, pêvajoyeka têgehîkirin, tetbîqkirin, hûrnêrîn, sentezkirin û/yan jî nirxandinê ya bi awayekî çalak û tekûz e bi armanca ku agahîya bi rêya çavdêrî, tecribe, fikirîn, hûrfikirîn yan jî peywendîyê bi dest ketî ji bo bawerî yan jî kirinan wezîfeyeka rêberîyê bigire ser xwe. Fikirîna rexneyî, ne ew e ku naverokê xelet qebûl bike yan jî lekedar bike, lê ew e ku melekeyên çavdêrîkirin, fikirîna piralî ya berpêyî hema agahîyeka hatî dayîn û yên gihiştina biryarekê li ser vê xetê bi pêş da dibe. Fikirîna rexneyî di pedagojîyê da, wekî berevajîya fêrbûna girêdayî jiberkirinê dihê hesibandin. Fikirîna rexneyî teşwîq dike ku kesê fêrbûyî, tiştа ji bo wî hatî qalkirin bi hemû berfirehîyê fam bike. Beşdarên komê di Xema Min Reqs e da, dihên teşwîqkirin ku li ser agahîyên bo wan hatî dayîn bifikirin û nîqaşên derheqê mijarê da bidomînin. Ev nîqaş dê tevkarîyê bikin di avakirina sûbjektîvîteya her beşdarî bi xwe da.

---

[3] https://www.criticalthinking.org/pages/defining-critical-thinking/766

| Çalakîya 1. | Çalakîya 2. | Çalakîya 3. | Çalakîya 4. | Çalakîya 5. |
| --- | --- | --- | --- | --- |
| Hafizeya Bedenî | Hayjêbûna Bedenî | Hafizeya Bedenî | Fikirîna Rexneyî | Xweîfadekirin |
| Mîrateya Kultûrî | Tecribeya Reqsê ya Şexsî û Kolektîf | Hefizeya Sehekî | Xweîfadekirina bi Hûnerê | Fikirîna li ser Berhema Xwe |
| Vîna Azad | | Guhdarkirina Aktîf | Veguhestina Tecribeyê ber bi Kirina Afirîner ve (Tecribeya Reqsê -> Hilberîna Dîmenî) | Pêkhatina Hafizeyên Nû |
| Çêkerî | | Fikirîna li ser Tecribeya Xwe | | Parvekirina Navbera Şexsan |



## BEŞA III: RÊZEÇALAKÎYÊN XEMA MIN REQS E

### ÇALAKÎYA 1: FAM BIKE

**Armanc:**

Di çalakîya ewil da, mirovekî rasteqîn yê di mijareka dîyar ya reqsê da bûye xwedî tecribeyekê di jîyana xwe da, “dilxwazekî reqsê” bi beşdaran dide naskirin. Vîdeoya vî kesî ya ji parçeyên çîroka wî ya rasteqîn ya bi hafizeya sehekî ya derheqê reqsê da hûnandî bi beşdaran dihê temaşekirin. Armanca vê çalakîyê ew e ku,

1. Beşdaran bi tecribeya rasteqîn ya mirovekî, çîrokekê û reqsekê biîne rûbirûyî hev
2. Qadeka vekirî ya nîqaşê veke ji bo beşdaran ji bo ku bikarin lê fikir, raman û hestên xwe aşkere bikin, li ser melzeme û vegotina di vîdeoyê da bifikirin, nîqaşa vê ya rexneyî pêk biînin;
3. Çêkirina qadeka fikirînê ya li dor têgehên wekî hafizeya bedenî, mîrateya kultûrî, vîna azad, çêkerîyê.

**Têgeh:**

Hafizeya Bedenî, Mîrateya Kultûrî, Vîna Azad, Çêkerî

**Amadekarîya çalakîyê û melzemeyên hewce:**

Melzeme: Video player, ekran, hoparlor

Amadekarî: Hêsanker ji bo ku melzemeya xebatê nas bike, pêşî çîrok-vîdeoyê temaşe dike.

**Birêveçûna çalakîyê:**

- **Destpêka çalakîyê (15 deqîqe**

Hêsanker bi kurtî bernameyê dide naskirin û çalakîya ewil dide destpêkirin. Heger beşdarên komê hevûdin nas nekiribin, dihê pêşnîyazkirin ku navê xwe bibêjin û xwe bi kurtî bidin nasandin, çend agahîyên ku dixwazin derheqê xwe da parve bikin. Di beşa PÊVEK II – Ayê da, hindek lîstik hatine pêşkêşkirin ku dê di navbera beşdaran da hesta kombûnê çêbike, rê li ber hevnasînê veke û beşdaran hînî derdorê bike.

Kom piştî ku lê germ bibe, hêsanker Bernameya Xema Min Reqs e dide naskirin, behsa armancên xwe û amûrên ku dê bihên bikaranîn (wekî temaşekirina vîdeoyan û beşdarîya li wê) dike û kurteyeka pênc çalakîyên dahatîyê pêşkêş dike.

- **Temaşekirina çîrok-vîdeoyê (5 deqîqe)**
  Çîrok-vîdeo, bi awayekî esasî, parçeyên ji çîroka jîyana “Dilxwazê Reqsê” ji devê wî dide qalkirin. Dilxwazê Reqsê di vîdeoyê da, têkilîya çîroka jîyana xwe ya bi reqsa berbehs ra dîyar dike; qal dike ka ev reqs ji ber kîjan sedemên şexsî li ser wî xwedî tesîreka taybet e. Dilxwazê Reqsê, qal dike ka reqskirin kîjan hîsan di bedena wî da dide livandin û qala hest û bîranînên xwe yên girêdayî van dike. Gotinên dilxwazî gelekî muhîm in ji ber ku di nîqaşên piştî çîrok-vîdeoyê da peyvên serekî dê ji van pêk bihê.

- **Nîqaş (20 deqîqe)**
  Beşa nîqaşê gelek muhîm e ji alîyê dabînkirina beşdarîya aktîf ya beşdaran ve. Hêsanker, bi pirsa ka ‘bi ya beşdaran çîrok-vîdeoya hatî nîşandan çawa ye’ nîqaşê dide destpêkirin; di pêkanîna vê yekê da têgehên serekî bi kar diîne û wan teşwîqî fikirîna rexneyî dike. Di vê merhaleyê da, muhîm e ku meriv beşdaran vexwîne da azadane qala fikirên xwe bikin. Armanc ew e ku beşdar bi alîkarîya nîqaşê, çîroka dilxwazê reqsê têbigihin, qabilîyeta xwe ya fikirîna li ser tecribeya mirovekî dîtir zêdetir bikin. Fikirîna li ser tecribeyên kesên din, dê bingehekê amade bike da ku di çalakîyên dahatîyê da li ser tecribeyên xwe bifikirin. Armanca nîqaşê bi tu awayî ne ew e ku kirinên Dilxwazê Reqsê yên di vîdeoyê da wekî “rast” yan jî “şaş” bi nav bike û biryarekê li ser tecribeyên wî bide. Armanc, berevajî wê, ew e ku meriv li çîroka kesekî din guhdarî bike û li ser wê bifikire, qîmetê bide tecribe û bîranînên ku vî kesî parve kirîye.

Hêsanker dikare van pirsên li jêrê bike ji bo ku nîqaşê bide destpêkirin yan jî domandin. Di vê rewşê da, girîng e ku meriv bizane bersivên beşdaran ne rast yan jî şaş e.

Karakterê di vîdeoyê da kî ye? Li kû dijî? Berê li kî deran dijîya?

*Ev pirs, dê bihêle ku Dilxwazê Reqsê di ser naveroka çîrokê ra, ya wî di vîdeoyê da qal kirî, derbas bibe û bibe alîkar ji bo beşdar çîrokê baştir fam bikin.*

Reqsa ku wî behs kirî, cara pêşî li kû, çawa, bi kê ra keşif kir?

*Ev bi awayekî esasî pirsên famkirinê ne. Hin ji beşdaran çêdibe ku tecribeya berbehs ya di vîdeoyê da rehettir yan jî baştir fam bikin. Hêsanker, di vê rewşê da dikare bi rêbaza fêrbûna ji hemsalan hereket bike. Ew beşdarên han, dikarin çi-bûna vê hêmana dîyar ya di vîdeoyê da behs bûyî ji kesên mayî yên komê ra, li gor tecribeyên xwe, rave bikin. Mînak, heger karakterê serekî behsa daweteka kolanê bike, hin beşdar dikarin mînakên daweteka bi vî awayî yên ji nav jîyana xwe bibêjin yan jî dikarin agahîyên xwe yên derheqê çawa-bûna daweteka kolanê da parve bikin. Hêsanker, divê ji alîyekî da lê miqate be ku beşdarek di nîqaşê da ne serdest be, ji alîyê din da jî*

*pûte pê bide ji bo ku di navenda nîqaşê da kes xwe li stîgmatîzasyona kultûrî û hikimên dîyarkirî (kalıpyargı) negire.*

Mîrateya kultûrî ji bo karakterê di vîdeoyê da dihê çi maneyê? Mîrateya xwe ya kultûrî çawa hildigire? Ev mîrate ji bo wî çi îfade dike?

*Meriv dikare wekî têgeh li ser mîrateya kultûrî, ji pênaseya wê ya giştî û berbelav heta cihê wê yê di tecribeya şexsî da, di mijareka berfireh da lê hûr bibe. Hêsanker di vir da beşdaran teşwîq dike ku bibînin û keşif bikin ka Dilxwazê Reqsê li gor hin tecribeyên xwe yên dîyarkirî çawa hin alîyên kesayetîya xwe pêk anîne. Reqseka dîyarkirî di kîjan maneyê da parçeyekî mîrateya kultûrî ye? Meriv dikare reqsê fêr bibe, nîşan bide û bide fêrkirin; nexwe tecribeyên nû yên li dor reqsê çawa dikarin bihên avakirin?*

Hafizeya bedenî û sehekî çi ye? Di vîdeoyê da çawa hatîye behskirin? Vê hafizeyê şopeka çawa li karakterê vîdeoyê hiştîye?

*Hin peyvên serekî yên ku Dixwazê Reqsê di dema behskirina tecribeyên xwe yên vîdeoyê da bijartî, çêdibe ku ji bo axaftina bi hûrgilî ya eleqedarî hestên li dû bîranînekê mayî û famkirina girîngîya vê bîranînê ya ji bo wî di navendeka taybet da bihê bikaranîn.*

Meriv dikare behsa alîyên cuda yên koçberîyê bike? Kesê di vîdeoyê da bi çi awayî behsa mesafeya mekanî dike? Ew kes bi cihên cuda ra çawa dihê peywendîdarkirin? Reqs tevî xwe çawa derdikeve geryanê? Behsa hereketîyeka nû yan jî koçberîyê dike?


*Hêsanker bi van pirsan, beşdaran teşwîq dike "rêwîtîyên fîzîkî" û "rêwîtîyên hestî" yên karakterî miqayeseyî hev bike. Her weha beşdar difikirin yan jî xeyal dikin ka reqsek çawa dikare derkeve geryanê*

Karakter çima reqsa berbehs ne li gor konteksta fêrbûyî lê li gor kontekstên din dike? Çi faydeya vê li wî heye?

*Bi vê pirsê çêdibe ku meriv têgeha çêkerîyê bi beşdaran bide naskirin. Di vir da çêdibe ku meriv çêkerîyê weke hêza biryargirtinê ya karakterî bifikire ku bîranîna aîdî konteksteka din, yanî hafizeya bedenî, di konteksteka nû da berceste dike. Li ser wê dihê nîqaşkirin ka çima ew kes vê biryarê girtîye û ev biryar bi çi awayî bûye alîkar di guherîna jîyana wî da. Çêdibe ku ji beşdaran bihê xwestin hin mînakên jîyana xwe bidin.*

- **Bidawîkirin (5 deqîqe)**

  Armanc nirxandineka giştî ya derheqê çalakîya ewil da ye. Hêsanker dikare bi rêbazên afirîner bi dawî bike yan jî ji bo temrîneka bidawîkirinê li beşa PÊVEK II – D binêre.



## ÇALAKÎYA 2: TECRIBE BIKE

**Armanc:**

Beşdar bi hereketkirina pêk ve û fêrbûna reqseka nû ya gav bi gav, dibin xwedî hayjebûneka bedenî ya cudatir. Bi rêya reqsa ku fêr bûne, mînakeka çêkerîyê tecribe dikin.

**Têgeh:**

Hayjêbûna bedenî, Tecribekirina Reqsê (Şexsî û Kolektîf)

**Amadekarîya çalakîyê û melzemeyên hewce:**

Melzeme: Video player, ekran, hoparlor

Amadekarî: Hêsanker berî çalakîyê vîdeoya perwerdeya reqsê ji serî heta binî temaşe dike. Qadekê li odeyê vedike ku her kes lê bikare rabe ser pêyan û bireqise.

**Birêveçûna çalakîyê:**

- **Lêgermbûn, bidestxistina hîsa layenî ya fîzîkî û mekanî (10 deqîqe)**

Kom, berî temaşekirina vîdeoya perwerdeya reqsê, dest bi xebatên lêgermbûnê dike.
Dest li Çokê (bnr. PÊVEK II – C)
Destmalê Bişopîne (bnr. PÊVEK II – B)

- **Li vîdeoyê temaşe bike û pêk ve bireqise (20 deqîqe))**

Hêsanker, beşdaran amadeyî temaşekirina vîdeoya perwerdeya reqsê dike ku ew wasiteya serekî ye ji bo fêrbûna reqsa berbehs. Hêsanker vîdeoyê dide destpêkirin û dibe alîkar ku beşdar Dilxwazê Reqsê yê di vîdeoyê da bişopînin û reqsê fêr bibin. Pêvajoya reqsê pêk ve, reqsê jî hem wekî şexsî hem jî wekî civatî tecribe dikin. Gava hewcehîya komê bi demeka berfirehtir hebe ji bo fêrbûna gavan yan jî heger hindek beşdar hêdîtir fêr bibin, hêsanker dikare her serê çend gava vîdeoyê bisekinîne ji bo ku tekrara gavan zêdetir bike. Hêsanker dikare ji bo alîkarîyeka zêdetir li beşa "Pêşnîyazên Tetbîqkirinê" binêre.

- **Nîqaş (10 deqîqe)**

Hêsanker, beşdaran vedixwîne nîqaşeka li ser tecribeyên fîzîkî û hestîyarî yên dema fêrbûna reqsê.

Pirsên li jêrê, bi wê armancê hatine amadekirin ku nîqaşê bide destpêkirin yan jî di dema nîqaşê da rêberîyê ji bo beşdaran bike.

Tecribeya te ya fîzîkî ya di vê çalakîyê da çawa bû?

*Ji bo ku beşdar bikarin hest û fikirên xwe parve bikin, ev pirsa ewil têra xwe bi awayekî nedîyarkirî dihê kirin.*

Te karî gavên xwe li gor komê biavêjî? Heger bersiva te erê be çawa, na be çima?

Tu çavnasê van gavan î? Kîjan ji bo we hêsan, kîjan zehmet in?

Tu dikarî peywendîyê bi tecribeya ku Dilxwazê Reqsê di vîdeoya ewil da behs kirî û hestên wî îfade kirî danî?

Tecribeya reqsa kolektîf çawa bû

- **Bidawîkirin (5 deqîqe)**

Armanc nirxandineka giştî çalakîya ewil e. Hêsanker dikare bi rêbazên afirîner bi dawî bike yan jî ji bo temrîneka bidawîkirinê li beşa PÊVEK II – D binêre.



## ÇALAKÎYA 3: BIFIKIRE

**Armanc:**

Bipêşdabirina qabilîyetên milaqata beşdaran yên wekî guhdarîkirina aktîf, hikimker nebûn, nîşe girtin, şopandina pirs û bersivên kesê pêşberî xwe.

Teşwîqkirina beşdaran ji bo ku li ser tecribeyên xwe bifikirin û bi çalakîyeka girêdayî piştgirîya hemsalan ya bi awayê cotî van parve bikin.

Peywendîdanîna bi hafizeya bedenî ya reqs yan jî straneke ra: Gihiştina hafizeya fîzîkî ya reqsekê yan jî stranekê bi pirskirinê, guhdarîkirinê yan jî qalkirinê.

Handana beşdaran ji bo ku li ser avakirina çêkerîya xwe û tecribeya xwe bifikirin.

**Têgeh:**

Hafizeya bedenî, hafizeya sehekî, guhdarîkirina aktîf, fikirîna li ser tecribeya xwe.

**Amadekarîya çalakîyê û melzemeyên hewce:**

Melzeme: "Pirsên Milaqatê" (Pêvek 1) yên prînt kirî, bi qasî hejmara beşdaran qelem û kaxezên miswedeyê yên A4.

Amadekarî: Hêsanker derdorê ji bo milaqatê amade dike, mase û sendelîyan bi awayê ku rûyê wan li hev be rêz dike. Beşdar li komên dukesî vediqetin.

**Birêveçûna Çalakîyê:**

- **Pêk ve bireqise (5-10 deqîqe)**

  Beşdar reqsa ku di çalakîya din da ji vîdeoyê fêr bûne tekrar dikin. Gava hewcehî pê çê bibe, vîdeo cardin dihê destpêkirin.

- **Pêvajoya Milaqatê (15 deqîqe)**

  Hêsanker pêşî, berî ku ev vîdeo bihê kişandin, qal dike ku ev milaqatek e bi Dilxwazê Reqsê ra derheqê rêwîtîya jîyana wî û reqseka muhîm da bê ka reqseka weha ya ew bi awayekî şexsî eleqedarî wê heye yan na. Destpêkirineka bi vî awayî dê bibe alîkar ku beşdar çalakîyên berî wî bi vê çalakîyê girê bidin. Rêbaza milaqatê gelekî muhîm e ji bo tecribekirinên nû û fêrbûna çîrokên nû ji mirovên derdora xwe. Bi van jêpirsînan meriv dikare reqseka yan jî straneka nû hîn bibe. Piştra hêsanker, ji beşdaran ra dibêje dê bi cotî bixebitin ji bo ku milaqatên xwe bikin û li çîrokên hevûdin guhdarî bikin.

Beşdar li komên dukesî vediqetin. Hêsanker pirsên milaqatan belav dike. Çend deqîqeyan dide beşdaran da ku wan bixwînin û li ser wan bifikirin.

Di her koma dukesî da beşdar milaqatê bi hevûdin ra dikin. Her zarokek pirsên milaqatê ji yê din dike û bersivên zarokê din li kaxezê dinivîse. Beşdarên ketî nav pêvajoya milaqeteka weha dihên teşwîqkirin ku li ser hafizeyên xwe yên bedenî bifikirin.

Beşdarê ku pirsan dike, tenê bersivan wekî nîşe dinivîse, şirove nake yan jî naguherîne.

Di rewşên hewce da, hêsanker dibin alîkar di nîşegirtina beşdaran da. Bi berçavkirina asta zimanî û qabîlîyeta îfadeya devkî û nivîskî ya beşdaran ra, çalakî ji nû ve dihê sêwirandin.

- **Çavpêxistin (5 deqîqe)**
  Hêsanker ji beşdaran dixwaze kaxezên milaqatê bidin hevalên xwe û her beşdarek çavekî bi bersivên xwe bixe. Heger bixwazin biguherînin, dikarin guhertinan li bersivên xwe zêde bikin.

- **Vesazkirina gava li dû wê (5 deqîqe)**
  Hêsanker dîyar dike ku dê di çalakîya dahatî da li ser pirsa "Hûn bersivên xwe bi bikaranîna melzemeyeka dîmenî dixwazin çawa pêşkêş bikin?" bixebitin. Di hevdîtina çarem da lê zêde dike ku dê posterê bi xêz û sêwirandinê çêbikin.

- **Nîqaş (10 deqîqe)**
  Hêsanker nîqaşeka li dor têgehên wekî "guhdarîkirin, parvekirina tecribeyê, hafizeya bedenî, fikirîna li ser tecribeya xwe, kiryarî û kapasîteya reqskirinê" dide destpêkirin. Çêdibe ku bi pirsên wekî, Guhdarbûn di milaqatê da hesteka çawa bû? Xweqalkirin hesteka çawa bû? bihê destpêkirin.

- **Bidawîkirin (5 deqîqe)**
  Armanc, nirxandineka giştî ya çalakîyê ye. Hêsanker ji bo temrîneka bidawîkirinê li PÊVEK II – Dyê binêre.


DANCE

## ÇALAKÎYA 4: AVA BIKE

### Armanc:

Di vê çalakîyê da beşdar ji bo ku tecribeyekê û hafizeya şexsî bi melzemeyeka dîmenî îfade bikin, teknîka çêkirina posteran bi kar diînin. Di vê rêbazê da beşdar, hin tercîhan dike ji nav hêmanên bijartî yên eleqedarî bîranînan ji bo ku veguhezîne posterî û ev li ser posterî dihê cîbicîkirin. Bi vî awayî hafizeya berbehs diparêzin û tecribeyekê li ser wê ava dikin.

### Têgeh:

Fikirîna rexneyî, xweîfadekirina bi rêya hûnerê, veguhestina tecribeya eleqedarî reqsê bo hilberandina afirîner

### Amadekarîya çalakîyê û melzemeyên hewce:

Melzeme: Kaxezên A3 yên bi rengên cuda, meqes, zemq, kupûrên nivîsê yên resim û kovarên curbicur, qelem, marker û melzemeyên dîtir yên ku ji bo hilberandina hûnerî dikarin bihên bikaranîn. Qadeka ku beşdar bikarin rûniştî yan jî bi awayekî din yê rehettir lê resiman çêbikin.

Amadekarî: Di vê çalakîyê da, dê bersivên milaqata di çalakîya sêyem da bihên bikaranîn. Berî ku derbasî çêkirina posterî bibin, li beşdaran kaxezên wan yên bersivê dihên belavkirin, beşdar di ser bersivên xwe ra derbas dibin.

### Birêveçûna Çalakîyê:

- **Destpêka çalakîyê (15 deqîqe)**

  Hêsanker pêşwazî li beşdaran dike. Ji wan dipirse ka şiroveyeka wan ya derheqê çalakîya borî da heye yan na. Piştî vê yekê kom lîstikekê dilîze. Dihê pêşnîyazkirin ku lîstik bila lîstikeka weha be da qadeka afirîner teşwîq bike, îdraqa sehekî ya beşdaran bide livandin.

- **Çêkirina posterî (25 deqîqe)**

  Hêsanker dîyar dike ku li gor hafizeya şexsî ya beşdaran ya derheqê reqsekê (yan jî stranekê) da, bi alîkarîya bersivdayînên wan yên çalakîya borî dê posterekî amade bike. Beşdar heta ku ji wan dihê ji bo ku posterekî şexsî amade bikin, dikarin her cure melzemeya hazir bi kar biînin.

  Hêsanker ji bo birêvebirina çalakîya poster-çêkirineka afîner û kartêker, dikare plana li jêrê bi kar biîne.

**1. Di posterê da dixwazim çi nîşan bidim?** Li dor vê pirsê dihê nîqaşkirin ka fonksîyon û armancên çawa yên posterekê hene.

- “Dixwazim çi tiştê hafizeya xwe parve bikim?”
- “Di posterê da ez li kû me, rola min ya li vê derê çi ye?”
- “Dixwazim vê posterê nîşanî kê bidim?”
- “Gava ku vê posterê bibînin, dixwazim ew çi fam bikin?”

**2. Plana Posterê li ser Kaxezê:** Hêsanker di dema çêkirina posterê da dikare berê beşdaran bi alîyên dîtir bide lê tu carî van wekî qayîde pêşkêş nake.

- “Ez dixwazim resimên ji kovaran bi kar biînim (kupûr), yan dixwazim bi xwe xêz bikim?”
- “Ez dixwazim metinekê, herfan yan jî nivîsê bi kar biînim?” Nivîsandina bi herfên mezin dê xwendina posterê rehettir bike. Her weha nivîsên li ser kupûran jî çêdibe ku bihên jêkirin û zeliqandin û bi vî awayî bihên bikaranîn.

Her posterek xwedî peyamekê ye. Ev peyam çêdibe bi awayê vekirî û rasterast fambar jî bihê dayîn, û bi awayekî veşartî û metaforîk jî bihê pêşkêşkirin û neqilkirin. Hêsanker dikare li ser veşartîbûn, vekirîbûn, kartêkerîya peyama di posterekê da biaxive. Berê beşdaran li gor bersivdayînên wan yên dema milaqatê li sêwirandina posterê dizivirîne.

- “Dixwazim kîjan rengan bi kar biînim?”
- “Di vê posterê da ez dê fikirên xwe bi kîjan hêmanan veguhezînim ser kaxezê? Yên tişteyan, heywanan, daran, amûran, îşaretan, fîgurên mirovan?”
- “Kîjan hêmanan, divê li ser rûerdekî (arkaplan) çawa bi kar biînim?”

Heger xebat li ser kaxezeka mezin be, çêdibe ku teknîkên cihêreng bihên bikaranîn. Hêsanker pêşî ji bo beşdaran pêşnîyaz dike ku planeka posterê li ser kaxezê çêbikin. “Çi dê li kû cîbicî bibe?”

- “Li ser kaxezê divê ji nîvekê dest bi xêzkirinê bikim? Divê bi awayê ji hundirî ber bi derve yan bi awayê ji jorê ber bi jêrê ve bixebitim? “
- “Divê ez hêmanên di posterê da (mirov, tişte, siruşt, metin hwd.) bi çi awayî li ser kaxezê cîbicî bikim?”

Hêsanker bi bîra beşdaran dixe ka dê kîjan melzemeyan di sinifê da hazir bihêle, û dikare fikirekê bide bê ka dikarin çawa wan bi awayekî afirîner bi kar biînin.

**3. Pêşnîyazên Giştî:** Hêsanker divê emîn be ka her kes demê bi awayekî aktîf bi kar diîne yan na. Heger hin beşdar li paş bin, hêsanker bi berçavkirina dema dîyarkirî ra car caran wan zîyaret dike û dibe alîkar ji bo ku karê xwe di dema xwe da biqedînin.

Heger hin beşdar hebin ku di mijara zelalkirina fikirên xwe yan jî biryargirtina fikireke ji nav gelek fikiran da zehmetîyê dikişînin, hêsanker diçe cem van kesan, alîkarîya wan dike lê di alîkarîyê da midaxele nake. Li şûna ku fikirên cuda/yên zêdetir pêşnîyaz bike da li posterê bihên zêdekirin, ji bo zelalkirina fikirên berbehs yên wan kesan pirsan dike û hêzê dide wan da van li posterê zêde bikin. Beşdar gava hêmaneka nû ya girêdayî tecribeya xwe ya şexsî pêk diînin, dê li ser bixebitin ka dikarin kîjan melzemeyan bi kar biînin û tecribeyên xwe bi awayekî dîmenî çawa îfade bikin.

Di dawîya maweyê da, hêsanker hemû beşdaran pîroz dike. Poster bi temamî neqedîyabin jî, xebat bi dawî dibe. Ji alîyê din ve, dihê amajekirin ku ev qonaxeka afirandina hûnerî ye û bê ka kengî dikarin li ser wê xebata xwe bidomînin yan jî heger bixwazin dikarin dest bi ya nû bikin.

- **Bidawîkirin (5 deqîqe)**

Hêsanker, dîyar dike ku dê di çalakîya dawî da hemû poster bihên nîşandan. Dê galerîyeka poster/hûnerê bihê çêkirin û beşdar dê vê bi komî zîyaret bikin.

Hêsanker qadê bi alîkarîya beşdaran paqij dike.

Hêsanker, her kesî wek xelekekê dicivîne ji bo ku çalakîyê bi awayekî giştî binirxîne û ji wan pirsên derheqê pêvajoya tecribeyên wan da dike. “Çêkirina posteran tecribeyeka  çawa bû? Bi çi awayî ji pêvajoya milaqatê cuda bû? Axaftina derheqê reqsê da, parvekirina hafize û fikirên xwe, cudatir e ji kirina bi awayê melzemeyeka dîmenî, posterekê, îfadeyeka hûnerî? Çawa?”



## ÇALAKÎYA 5: PARVE BIKE

**Armanc:**

Di çalakîya dawî da, hemû beşdar di nav tecribeyeka kolektîf da, berhemên xwe yên şexsî yên hûnerî bi hevûdin ra parve dikin û bi awayekî serbest peformansên xwe pêşkêş dikin. Armanca li vir ew e ku;

Berhemên dîmenî yên Bernameya Xema Min Reqs e bihên nîşandan.

Bingehek bihê danîn ji bo fêrbûna reqsên cuda, gavên nû.

Bihê nîşandan ku her kes dikare bibe "Dilxwazekî Reqsê" yê reqsekê dike û dide fêrkirin.

**Têgeh:**

Xweîfadekirin, fikirîna li ser berhema xwe, çêbûna hafizeyên nû, parvekirina navbera kesan

**Amadekarîya çalakîyê û melzemeyên hewce:**

Melzeme: Hemû poster, bant, miqnetîs, derzî û/yan jî ta yan jî melzemeyeka din ya ku bikare posteran bi dîwaran ve sabît bike. Odeyeka ku dîwarên wê misaîd bin ji bo hilawistina posteran û qadeka wê hebe ji bo ku bi komî meriv bikare li ber posteran biaxive. Hoparlor û muzîklêderek.

**Birêveçûna çalakîyê:**

- **Destpêka çalakîyê (5 deqîqe)**

Hêsanker kurteyeka çalakîya dawî dide û pêşwazî li beşdaran dike. Ji wan dipirse ka hest, bîranîn yan jî şiroveyeka wan ya derheqê çalakîya dawî da heye ku bixwazin parve bikin.

Hêsanker dîyar dike ku dê pêk ve derkevin "gera pêşangehê" û dê piştra dema wan hebe ji bo ku reqs û stranên xwe nîşan bidin, fêrî hevûdin bikin.

- **Amadekirina qada pêşangehê (5 deqîqe)**

Beşdar bi alîkarîya hêsankerî, bi dîyarkirina qadekê yan jî quncikekê li ser dîwarî, maseyê yan jî zemînê qadeka pêşangehê disêwirînin ji bo ku her karek (posterek) li ser bihê nîşandan.

Hemû beşdar dihên vexwendin ku bi bant yan jî miqnetîsê cihên hilawistina posterên xwe hilbijêrin. Her kes posterê xwe dihilawîse/cîbicî dike.

- **Gera Pêşangehê (20 deqîqe)**

Beşdar mimkin be pêşî odeyê diterikînin û wekî ku komeka nû hatî zîyareta pêşangehê bin, cardin pêk ve dikevin odeyê. Kom hemû, hemû posterên li odeyê bi komî yek bi yek temaşe

dikin. Hêsanker tevî komê li pêşangehê digere. Çêdibe ku li pêşberî her xebatê nîqaşeka kurt pêk bihê. Zarokên ku dixwazin xebatên xwe bi gotinî pêşkêş bikin, piştî ku axivîn dikarin pirs û şiroveyan ji komê wergirin.

Heger hindek zarok li şûna qalkirina bi gotinî ya li ser posterên xwe bixwazin reqsa di posterê da behs bûyî nîşan bidin, hêsanker qadê ji bo parvekirineka weha jî vedike. Zarokên ku bixwazin dikarin di dema meşa pêşangehê da hindek gavên reqsê nîşan bidin. Hêsanker dikare bi bîra beşdaran bixe ku piştî gera pêşangehê dê dema wan hebe ji bo parvekirina reqsa xwe û fêrkirina hevûdin.

- **Dema serbest ji bo reqsê (10 deqîqe)**

Wext ji bo komê dihê dayîn da bi rehetî bireqisin. Dikarin reqsên xwe yan jî gavên xwe yên di reqsan da nîşanî hev û fêrî hev bikin. Herî dawî, pêk ve cara dawî reqsa ku ji Dilxwazê Reqsê yê di vîdeoyê da fêr bûne pêk diînin.

- **Bidawîkirin (5 deqîqe)**

Hêsanker, dikare vegere mijarên nîqaşê yên di çalakîya ewil da. Çend têgehên di çalakîyên berê da bi kar hatî di ber çavan ra dihên derbaskirin. Ev, dê derfetê bide beşdaran ku piştî tecribeyên Bernameya Xema Min Reqs e, careka din derheqê mijarên nîqaşê da xwe îfade bikin.

Çêdibe ku li ser çalakîyeka bidawîkirinê ya wekî Paşragihandina Pênc Tilîyan bihê sekinîn. (bnr. PÊVEK-II-E). Bi wesîleya vê çalakîyê, kom Bernameya Xema Min Reqs e bi awayekî bitûnî dinirxîne.

## PÊŞNÎYAZÊN TETBÎQKIRINÊ

Ev kitêbok, ji bo alîkarîya hêsankerî ye ku bikare atolyeyeka vesazbûyî bi rê ve bibe û bi awayekî giştî tenê behsa mijarên herî girîng dike. Kitêbok û Çalakîyên Xema Min Reqs e, her tim misaîd in bi fikirên nû bihên kemilandin li ser mijara bê ka bername dê çawa bihê tetbîqkirin.

Çareserîyên pedagojîk yên cuda yên ku dê li rêbaz, lîstik û helwestên di kitêbokê da bihên zêdekirin, her tim mimkin in. Her kesê ku bixwaze bi rola hêsankerî di vê xebatê da cih bigire, dikare fikir û tecribeyên xwe, pêşnîyazên xwe bi me ra parve bike.

Ji bo têkiliyê:
www.hep-beraber.org
www.alle-zusammen.org
www.germanturkishinitiative.org

**Mezinahîya Îdeal ya Komê û Pêşnîyaz derheqê Beşên Temenî da:**

Armanca beşdarên Bernameya Xema Min Reqs e ew e ku bihên piştgirîkirin ji alîyê mijarên wekî baştirkirina qabîlîyeta xwe ya fikirîna rexneyî, fikirîna li ser tecribeyên jîyana xwe, parvekirina reqs yan jî straneka di tecribeyên xwe da bi kesên din ra.

Bernameyeka kêrhatî ye ji bo ku bi awayekî komî bihê tetbîqkirin. Dihê pêşnîyazkirin ku bi komên 6 heta 15 kesî yên 12 salî û mezintir ra bixebitin.

Ji bo ku çalakî bi beşdarên temenbiçûktir ra bihê tetbîqkirin, dihê pêşnîyazkirin ku beşên nîqaşê kurt be û demên serbest zêdetir bo beşdaran bihê hiştin.

Bername misaîd e ji bo ku bi zarokên di ser 12 salan ra, bi ergenan ra û hetta bi ciwanên gihayî ra bihê birêvebirin.

Li gor mezinahîya komê û tercîhên hêsankerî, çêdibe ku çalakî bi du hêsankeran ra bihê birêvebirin.

### Derheqê Giştgirîyê da:

UNESCO perwerdehîya giştgir wekî "pêvajoya bersivdanê ya ku beşdarîya fêrbûyîyan li pêdivîyên cuda, li perwerdehîyê, kultûrê û civakê zêde dike û cudaxwazîya di nav sîstema perwerdehîyê da kêm dike" pênase dike. Bernameya Xema Min Reqs e jî di honak, gav, rêbaz û çareserîyên xwe yên çalakîyê da jî hewil dide nêzî perwerdehîya giştgir bibe.

Hemû çalakîyên di nav çarçoveya bernameyê da ferz dikin ku sehek bi awayekî zelal aktîf bin û beşdarîya fîzîkî hebe. Dema ku hewcehî bi piştgirîyeka taybet ya beşdaran hebe, xalên ku dê bihên berçavkirin:

- Divê meriv baldar be ka çalakîyên birêveçûyî gihiştine armanca xwe û bi pêdivîyên komê ra li hev dikin yan na

- Li şûna ku pêdivîyên fîzîkî, ruhî û sehekî yên zarokan wekî asteng û pirsgirêkekê bihên nirxandin, divê meriv lê hûr bibe ka çareserîyên çalakîyê dê çawa bihên baştirkirin

- Divê meriv her tim alîkarîyê ji şêwirmendên psîkolojîk û mamostayên perwerdehîya taybet bixwaze

Bi taybetî gava ku meriv bi komên beşdaran yên xwedî kultûrên cuda ra dixebite, gelemperkirinên neteweyî, kultûrî yan jî cografî rê li ber derketina pêş ya hikimên dîyarkirî (stereotîpan) vedike lewra jî xisûsîyetên şexsî yên beşdaran piştguh dibin yan jî li pişt van gelemperkirinan wenda dibin. Her weha, barkirina xisûsîyetên şexsî li komeka dîyarkirî jî pêş-hikiman han dide. Ji ber vê, hewce ye ku nerîn û helwesteka,
- li gor pêş-hikiman hereket nake
- zimanekî gelemperkirî bi kar naîne

bihê qebûlkirin.

### Pêşnîyazên derheqê Dînamîkên Koman da:

Hêsanker, di plansazî û birêvebirina çalakîyê da van pirsên li jêrê ji xwe dike:

- Ez komê nas dikim? Ez berê bi komê ra xebitîme?

- Zarokên di komê da hevûdin nas dikin?
- Zarok berê beşdarî çalakîyeka weha bûbûn yan jî bi awayekî din temasa wan bi vê mijarê ra çêbûbû?

Li gor bersivên van pirsan, hêsanker biryar digire ka dê kîjan lîstikên lêgermbûn û hevnaskirinê bilîzin.

Ji ber ku kom dê li mekanekî nû bibe xwedî tecribeyên aktîf, dikare pêdivî pê bibîne ku di vê pêvajoyê da bihê piştgirîkirin û bihêzkirin. Ji ber vê yekê, bijartina peyvên pozîtîf û cesaretkar dê rehettir komê motîve bike.
Derfetdayîna xweîfadekirina her zarokî û piştgirîya beşdarîya wan dê xwedî tesîr be di bihêzkirina motîvasyonê da.

Girîng e ku bi heman maweyê wext bo her beşdarî bihê terxankirin. Ji alîyê din ve, her tim dê hin beşdar hebin ku dê nikaribin bi awayekî aktîf beşdar bibin. Faydeya wê dê hebe ku meriv tu caran rasterast îşaret bi rewşekê neke û bêyî ku beşdarê berbehs bike cihê eleqeyê, bi navê wî xîtabî wî bike, car caran fikirê wî bipirse, dem bi dem biçe cem wî û derheqê mijara mijûlahîya wî da pê ra sihbeteka kurt bike. Ev helwest li cem wî kesî dê hîsa “bi aktîfî beşdar nebim jî ne mesele ye, di komê da dihêm qebûlkirin û kengî bixwazim beşdarî wan dibim,” çêbike.

Her tim mimkin e ku hest yan jî nexweşîtîyên xirab biqewimin. Destûrê bidin bila ev kêlî biqewimin û demekê berdewam bikin. Girîng e ku meriv bi awayekî cidî li zarokan û hestên wan binêre û bi wan ra têra xwe eleqedar be. Hêsanker di rewşên weha da dê wezîfe yan jî çalakîyan li gor rewşê biguherîne.

**Xebitîna digel Komên Pirzimanî:**

Xebitîna digel komên pirzimanî, bi taybetî jî heger pisporîya hemû beşdaran ya di zimanê hevpar da ne nêzî hevûdin be, dibe ku zehmet be.

Her beşdar, herî kêm zimanekî diîne nav xebatê û girîng e ku meriv hay ji zêdehîya zimanên komê hebe. Divê qîmeta vê zengînîyê (parvekirina qadeka jîyanê ya pirzimanî) bihê zanîn û piştgirîya vê bihê kirin. Xwehîskirina wekî parçeyekî komê/civatê, ji nêz ve eleqedarî pîrozbûyînê ye. Kesek gava di qada fêrbûnê da peyveka zimanê malbatê bibihîze, hesta peywendîyeka xurttir

pêk dihê. Gava ku zimanê beşdarî yê malbatê di derdoreka wî ya nû yan jî derdora perwerdehîyê da bihê karkirin, dibe ku hîsa qebûlbûna wî kesî xurttir bike.

Bikaranîna zimanên cuda di çalakîyan yan jî hevdîtinan da, dê bibe alîkar ku ciwan hîs bikin ew wekî endamekî rasteqîn yê komê hatine qebûlkirin.

Mimkin e ku hêsanker tenê bi zimanekî bizane. Ev rewş bi tu awayî ne asteng e li hemberî birêvebirina Bernameya Xema Min Reqs e. Xwe bi awayekî eşkere li fêrbûnê bi cih dike û heger fedî neke ji beşdaran bipirse, birêvebirina bernameyê dê têra xwe hêsan bibe. Ser meseleyê, bi pirsa “Kesek heye ku vê peyvê di zimanekî din da dizane û bixwaze wê parve bike?” dikare nêzîkî komê bibe.

Heger meriv rasterast deng li beşdarekî bike û pirsên wekî “Di zimanê TE da X dihê çi maneyê?” yan jî “HÛN di kultûra xwe da vê reqsê çawa dikin?” bipirse, dê mesafeyekê di nav komê da çêbike û rê li ber zimanekî “em û hûn” veke. Tew xwe weha jî bi nav neke, dîsa jî dê rê li ber etîketkirina kesekî ya bi zimanekî yan jî kultûrekê veke. Bi gotineka din, dê vî kesî bi neteweyekê, tradîsyonekê, bi kultûrekê yan jî cografyayê sînordar bike. Dikare bibe sedema cudahîyên wekî “Em û ew,” “kultûrên X û Yyê,” yan jî “kultûra min-kultûra te”.

Li şûna vê, pirsên wekî “X bi zimanekî din çawa dihê gotin, kes dizane?” yan jî “X di zimanekî cudatir da çi ye?” dê qadekê bo beşdaran veke û dê azadîyekê bo wan bibexşîne bê ka tiştek heye yan na ku bikarin parve bikin.

### Derheqê Zêdekirina Beşdarîyê da:

Girîng e ku meriv bi piştgirîya zarokan ra beşdarîya wan ya bi awayekî aktîf û dilxwaz ya li çalakîyê pêk biîne. Ji bo zêdekirina meraqê li cem zarokan û zêdekirina beşdarîya aktîf li xebatê, hewce ye ku meriv firsenda eşkerekirina hest û fikiran bide wan. Hin zarok dibe ku di beşdarîya aktîf ya li çalakîyên wekî reqs, milaqat, xêz yan jî pêşkêşîyê da bi fedîyokî tevbigerin û dilê wan yê axaftinê tune be. Ji bo van zarokan, li şûna reqskirin û axaftinê divê derfeta bikaranîna wasiteyên peywendîya bêgotin, nivîsandin û xêzkirin, bihê dayîn û alternatîf bihên pêşkêşkirin. Rêbazeka din jî, “rola çavdêrî” yan “rola wênegirekî ku wêneyên xeyalî digire” yan jî “resamê ku her tiştê qewimî xêz dike” dide beşdarên bi vî awayî. Di dema çalakîyê da çêdibe ku çend caran

li vî kesî bihê nihêrîn û jê bihê xwestin ku çavdêrî û berhemên xwe (heger bixwaze) parve bike. Bi vî awayî, zarok ne ku tenê xwe parçeyekî komê hîs dike, her weha bi wê hîsê dijî ku bi vî awayî tevkarîyeka girîng li kom û çalakîyê dike.

### Pêşnîyazên bo Fêrkirina Çep û Rastê:

Di xebatên reqs û fêrbûna gavan da çêdibe ku qordeleyên rengîn, etîket, kaxez yan jî ben bi pêyan ve yan jî heger bivê bi destan ve bihê girêdan û pêvajoya fêrbûnê rehettir bibe. Rengê qordeleya bi pêyê (yan jî zendê) rastê hatî girêdan divê cudatir be ji rengê bi yê çepê ve hatî girêdan. Bi vî awayî, zarok gava ku li reqsê bixebitin, hêsanker li şûna ku bibêje "çep-rast", navên rengan dibêje û piştgirîya fêrbûnê dike.

### Pêşnîyazên derheqê Temasa Fîzîkî da:

Gava zarok ji ber hin sedeman tercîh nekin ku destê xwe bi hevûdin bikin, hêsanker beşdaran ji ber vê tercîhê bi awayekî rehet dide hîskirin.

Di gelek reqsên komî yan jî  reqsên bi hevalî da lazim e meriv destê xwe bi hevûdin bike. Di vê rewşê da girîng e ku meriv ji bo kesên ne xwedî îhtiraz qadekê ava bike, rê li ber veke ku temasî hevûdin bikin û bireqisin.

Ji alîyê din ve, pêşkêşkirina alternatîfên cuda ji bo beşdarên ku di dema reqsê da tercîh nakin dest bidin partner / hevalên xwe li jêr berpirsîyarîya hêsankerî ye. Kesê ku naxwaze dest bidîyê, heger bixwaze dikare li kêlekê bipê yan jî heman reqsê bêyî destdanê hewil bide biceribîne. Ev jî dê tecribeyeka bedenî / hafizeyeka fîzîkî ya cuda ava bike. Heger bixwaze, gava ku di beşên nîqaşê da kesên din tecribeyên xwe parve dikin, divê ji bo vî kesî / van kesan derfeta axaftinê ya derheqê tecribeya xwe ya bedenî da bihê dayîn.

Girîng e ku hêsanker bibe mînakek ji bo wan û di nav komê da qadeka parvekirinê çêbike ku qebûla tercîhên cuda pêk biîne. Ev nerîn û helwest dê tevkarîyê bikin ku wekî afirandina qadeka fêrbûna giştgir, qebûla cihêrengîyan û zengînîyê bihê famkirin.

PÊVEK

## PÊVEK I: PIRSÊN MILAQATÊ

Reqs yan jî straneka dixwazî parve bikî dihê hişê te? Navê wê çi ye?

Tu vê reqsê yan jî stranê çawa fêr bûyî? Dikarî qal bikî?

Dihê bîra te bê ka te ev reqs herî dawî kengî û li kû kir? Tecribeyeka çawa bû?
YAN JÎ di bîra te da ye bê ka te ev stran herî dawî kengî li kû got? Tecribeyeka çawa bû?

Tu vê reqsê bi kê ra dikî? Tu bi tena serê xwe dikî yan jî bi komekê ra?
YAN JÎ tu vê stranê bi kê ra dibêjî? Bi tena serê xwe yan bi komekê ra?

Tu çawa hîs dikî gava ku vê reqsê dikî yan jî stranê dibêjî (yan jî guhdar dikî)?

Gavên vê reqsê çawa ne? Straneka dîyarkirî ya reqsê heye?
Muzîka reqsê yan jî melodîya stranê çawa ye?
Tu vê stranê bi amûreka muzîkê ra lê didî, dibêjî?

Te ev reqs yan jî stranê berê fêrî kesekî din kiribû?
Dixwazî bidî fêrkirin?

**Li vir pirsa xwe binivîse û wê ji hevalê xwe bipirse.**

## PÊVEK II

### A. ÇALAKÎYÊN HEVNASÎNÊ

- **Çengkirina Topê**

Armanc: Fêrbûna navê hevûdin, hereketkirin.

Beşdar li dor xelekekê rûdinin û topê hema resterê çengî hevûdin dikin. Kesê ku topê çeng dike, di dema çengkirinê da li hilgirê topê dinêre.
Di tûra ewil da, beşdar tenê topê çengî hevûdin dikin û rûbirû dibin.
Di tûra duyem da gava ku topê çeng dikin, navê xwe dibêjin.
Di tûra sêyem da, hilgirê topê pêşî navê kesê top çeng kirî wî, piştra navê xwe dibêje.
Di tûra çarem da, her beşdar navê kesê top çeng kirî wî, piştra navê xwe û herî dawî jî navê kesê ku ew dê topê çengî wî bike dibêje.
Girîng e ku di lîstikê da top bi destê her beşdarî bûbe.

- **Hereketa Xwe Bike, Navê Xwe Bibêje**

Armanc: Fêrbûna navê hevûdin, hereketkirin.

Beşdar li dor xelekekê dicivin.
Di tûra ewil da her kes bi dorê navê xwe dibêje û hereketên wekî lihevdana destan, destdana serî, çerxbûna li dor xwe, xweçengkirin... dike.
Tûra duyem bi kesê dest bi tûra ewil kirî dest pê dike. Her kes navê kesê piştî xwe dibêje û hereketa xwe dike.
Tûra sêyem cardin bi heman kesî dest pê dike. Ev kes, nav û hereketa kesê dawî yê tûra berî vê, yanî kesê berî xwe, tekrar dike û li vê ya xwe jî zêde dike. Kesê piştra, nav û hereketa kesê berî xwe tekrar dike, ya xwe lê zêde dike. Lîstik bi vî awayî li her kesê di xelekê da digere.

- **“her kesê ....... kirî”**

Armanc: Hevnasîn, peydakirina hevbeşîyên komê. Hînî qada xebatê bûyîn.

Hemû beşdar li dor xelekeka fireh li ser lingan dimîne.
Hêsanker dibêje “her kesê ... kirî” û hevoka ewil dibêje.
Her kesê li gor hevoka hatî gotin, gavekê ber bi hundirê xelekê ve diavêje, yek-du sanîyeyan disekine û piştra li cihê xwe yê di xelekê da vedigere. Hêsanker hevoka din dibêje. Vê carê komeka din ya beşdaran gavekê ber bi pêş da diavêje. Bi saya vê, curbicurîya mijarên hevpar dihê keşifkirin. Wekî van hevokên nimûne:

“Her kesê ku îro bi otobêsê hatî vir.”
“Her kesê ku îro bi meşê hatî vir.”
“Her kesê ku herî kêm xwişkeka/birayekî wî heye.”
“Her kesê ku herî kêm bi zimanekî dipeyive.”
“Her kesê ku berê jî reqs kirî.”
“Her kesê ku ji reqskirinê hez dike.”
“Her kesê ku hez dike spor bike.”
“Her kesê ku bi hevalên xwe ra li muzîkê dide û direqise.”

Hêsanker, heger her çalakîyeka Xema Min Reqs e di rojên cudatir da tetbîq bike, dikare vê lîstikê bi rêk û pêk bi kar biîne. Di destpêka her çalakîyê da dikare hevokên cuda derheqê çalakîya berî vê da lê bike û wê çalakîyê di bîr bixe. Mînak wekî,
“Her kesê ku navê dilxwazê Reqsê dihê bîra wan.”
“Her kesê ku navê reqsa di vîdeoya perwerdekirinê da dihê bîra wan.”
“Her kesê ku gava ewil ya reqsa di vîdeoya perwerdekirinê da dihê bîra wan.”
“Her kesê ku gava diçe malê, va tiştên me li vir kirî ji malîyan re dibêje.”

## B) ÇALAKÎYÊN LÊGERMBÛNÊ

- **Xeleka Çepikan**

Armanc: Lêgermbûn, peywendîdanîna bi hevûdin ra, baştirkirina koordînasyona dest-çavan û lihevîya nav komê.
Beşdar li dor xelekekê li ser lingan dimînin.

1. Beşdar di xelekê da, bi dorê bi awayê gerîna saetê carekê destê xwe li hev dixin.

2. Xeleka çepikan ber bi heman alîyî ve, lê vê carê bi tempoyeka hêdîtir dest pê dike, her ku diçe bileztir dibe û weha dihê tekrarkirin.
3. Beşdar hewil didin ku bi ya dora hevûdin bikin û bigihijin leza çepikan ya herî bilind û mimkin. Dihê dîyarkirin ku armanc digel lezgînîyê, bi şopandina hevûdin ra berdewamîyeka lihevkirî ya wekî pêlekê ye.

Her gavek heta ku hewcehî pê hebe, dikare bihê tekrarkirin.
Li şûna çepikan, wekî alternatîf bi şertê ku kefa destî li ya kesê alîyê çepê bikeve, çêdibe ku "dest bihê lihevdan." Ji bo zehmettirkirina lîstikê, kesek di tûrên piştî wê da xwe daqûl dike û her du kesên li her her du alîyê wî li ser pêyan "destê xwe li hev didin." Piştra kesê daqûlbûyî xwe rast dike û kesê li çepa wî xwe daqûl dike; kesên li ser pêyan yên li her du alîyê kesê daqûl bûyî "destê xwe li hev didin."

- **Destmalê Bişopîne**

Armanc: Berbelavkirina hayjêbûnê, zêdekirina baldarîyê, baştirkirina guhdarîya aktîf

Hemû beşdar dest pê dikin di odeyê da digerin. Hêsankerekî ku destmaleka rengîn (qumaşekî rengîn yan jî şerpe) di dest da jî tev li wan dibe. Di lîstikê da, kesê dest bi destmal pîrik e û çavê her kesî li ser wê ye.

Pirîka dest bi destmal li derdorê digere û piştra hereketeka dîyar ya wekî "daqûlbûn" yan jî "çengbûn"ê dike. Hemû zarok vê hereketê tekrar dikin.

Piştî ku her kes hereketê dike, pîrik destmalê dide kesekî din. Ew kes dibe pîrik, ew jî hereketeka dîyar dike û her kes vê tekrar dike.

Hereketên alternatîf: Pîrik li şûna hereketekê dengekî derdixe yan jî peyvekê dibêje. Dihê teşwîqkirin ku peyvên hatî gotin di zimanên cuda da hebin ji bo xebat pirzimanîya li sinifê biparêze.

## C. TÊGIHIŞTINA BEDENÎ

- **Hilavêtina Dilî**

Armanc: Hîskirina bedena xwe, berbelavkirina hayjêbûna bedenî

Zarok li dor xelekekê rûdinin.
Her zarokek bi destekî zendê xwe kontrol dike û hewil dide nebiza xwe peyda bike.
Zarokê nebiza xwe dîtî radibe ser lingan û bi lingê xwe, dest bi rîtimeka li gor hilavêtina dilî dike.

- **Sêva Şekirkirî**

Armanc: Berbelavkirina hayjêbûnê, bihêzkirina hevsengîya fîzîkî û zêdekirina leza reaksîyonê

Hêsanker muzîkeka rîtmîk lê dide. Zarok dest pê dikin li derdorê bigerin û bi muzîkê ra bireqisin. Hêsanker çer ku muzîkê digire, zarok di heman pozîsyona xwe da disekinin. Zarokên li ser pêyekî sekinî sêva şekirkirî ne û heta ku ji wan dihê maweyeka dirêj hewil didin sebît bisekinin.
Gava ku muzîk cardin dest pê dike, zarok bi hereketkirin û reqskirinê berdewam dikin. Piştra muzîk cardin qut dibe

- **Dest li Çokê**

Armanc: Fêrbûna bergindên beşên bedenî di zimanên cuda da, zêdetirkirina nêzîkbûna navbera beşdaran

Beşdar xelekekê çêdikin. Perwerdekar di beşa ewil ya lîstikê da du qisimên bedenê dibêje û her beşdarek di bedena xwe da van her du qisiman bi hevûdin dide. Mînak, wekî: Dest li çokê, pê li çokê, enîşk li enîşkê, dest li serî, kefa destî li çeneyê. Beşdar jî dikarin kombînasyonên xwe çêbikin.
Di beşa duyem ya lîstikê da, beşdar dihên cem hevûdin û dibin cot. Cotek dibe dilxwaz û du qisimên bedenê dibêjin. Hemû cot hewil didin wan qisimên bedena xwe bi awayekî beramber bi hevûdin bikin. Mînak, cotê dilxwaz heger bibêje “dest li çokê”, zarokek ji hemû cotan destê xwe bi çoka yê din dike. Cotê piştî wê, heger bibêje “pişt li piştê”, zarokên di hemû cotan da pişta xwe

didin hevûdin. Cotê di dorê da, heger bibêje “çene li milî”, di hemû cotan da zarokek çeneya xwe dadine ser milê yê din. Lîstik heta ku her cot kombînasyonekê bibêje, berdewam dike. Beşdar dikarin parçeyên bedenê bi zimanên cuda bibêjin.

Pêşnîyaz: Gava ku zarok fedî bikin temasî hevûdin bibin yan jî ji ber hin sedeman vê tercîh nekin, her du qismên berbehs yên bedenê bêyî ku bi hev bibe, tenê çêdibe ku nêzîkî hevûdin bihê kirin. Di rewşên weha da talîmat ji bo nêzîkkirina lebatê bedenê yan jî qisimên wê dihê dayîn. Heger tenê zarokek jî xwedî îhtirazeka weha be, divê perwerdeya talîmatê bi vî awayî bide.

## D. LÎSTIKÊN BIDAWÎKIRINÊ

- **Hereket-Sekin-Hafize** (Çêdibe ku wekî lîstika destpêkê jî bihê bikaranîn)

Beşdarek bi dilxwazî dibe pîrik û ji odeyê derdikeve. Beşdarên din dibin cot û her cotek pozîsyoneka bedenê dîyar dike. Cot di vê pozîsyona bedenê da hev dubare dikin û li pozîsyonên xwe dixebitin. Piştî amadebûna hemû cotan, cot ji hev vediqetin û li odeyê belav dibin. Her kes gava ku li ser lingan bi awayekî serbest disekine, beşdarê derketî derve dihê gazîkirin. Ev kes li nav odeyê digere û destê xwe bi milê kesên ku wî bijartine dike. Kesê ku dest bi milê wî bûyî, ji bo çend sanîyeyan, dikeve pozîsyona ku digel cota xwe dîyar kirine û paşê dîsa li pozîsyona xwe ya bedenî ya xweristî vedigerin. Beşdarê bûyî pîrik destê xwe yek bi yek bi milê her kesî dike, bi dîbîranîna sekinên hevgirtî ra hewil dide cotan tespît bike. Hevalên (cotên) ku wî tespît kirî di pozîsyonên bedenan da hişk disekinin. Pîrik gava ku hemû cotan dibîne, lîstik bi dawî dibe.

- **Muzîkê Xeyal Bike**

Beşdar di odeyê da li cihê ku bixwazin rûdinin. Hêsanker ji her kesî dixwaze ku bêdeng bin, çavê xwe bigirin (yên rehet hîs nekin dikarin negirin) û konsantreyî wê kêlîyê bibin. Pêşnîyaz dike ku fikirên di hişê xwe da bilez derbas dikin hêdîtir bikin, tew ji wan dûr bikevin. Her kes hewil dide li bêdengîyê guhdarî bike.

Derdor gava hêdî hêdî bêdeng dibe, hêsanker bala beşdaran dikişîne ser hengameya derveyê û dengên derdorê. Ji wan ra dibêje ku li van dengan guhdarî bikin.

Hêsanker, dikare bi pirsên besît yên wekî “Hûn dengên çawa dibihîzin? Baldar bin, kîjan deng tekrar dibin kîjan diguherin? Rîtmeka dengan heye?” araste bike.

Hêsanker ji beşdaran dixwaze ku xeyal bikin ev deng muzîkekê çêdikin. Dibêje ku girtin û berdana henaseya xwe jî li van dengan zêde bikin. Dibêje, "Em dengê henaseya xwe dibihîzin? Em xeyal bikin ku henaseya me digel van dengan muzîkekê çêdikin."

Ji bo maweyekê, her kes bê deng li muzîka ku ew bi xwe dibihîze/xeyal dike guhdarî dike. Beşdar hêdî hêdî çavê xwe vedikin, ji cihê lê rûniştî radibin. Bêdengî bi dawî dibe. Beşdarên ku dixwazin, dikarin hîs û çavdêrîyên xwe parve bikin.

## E. PAŞRAGIHANDIN


- **Asta Enerjîya Min**

Beşdar xelekekê çêdikin. Hêsanker dipirse ka ew çalakî çawa derbas bûye, beşdar bi bersivên kurt yên çendpeyvî tecribeya xwe dibêjin. Piştra, lîstikeka kurt ya bi navê "Asta Enerjîya Min" dilîzin.

"Vê gavê asta enerjîya min çawa ye?"

1. Beşdar asta enerjîya xwe ya wê gavê bi çixêzeka tîkane ya destan xêz dikin û nîşan didin.
2. Beşdar asta enerjîya xwe ya wê gavê bi leza çepikên xwe nîşan didin.
3. Beşdar pêk ve rengekî dibijêrin ku li gor her asteka enerjîyê ye. Bi vî awayî ji bo Bernameya Xema Min Reqs e skalayeka "enerjî – reng"ê çêdibe. Piştî her çalakîyê, her beşdarek rengekî ji vê skalayê dibijêre ku asta enerjîya wan bi xwe nîşan dide.
4. Beşdar pêk ve dengekî dîyar dikin ku li gor her asteka enerjîyê ye. Ji bo maweyekê, li her dengî dixebitin. Piştra bi dorê her zarokek dengekî derdixe ku asta enerjîya wan ya wê gavê nîşan dide. Herî dawî, her kes dengê xwe di heman demê da dike.

- **Paşragihandina Pênc Tilîyan**



Hêsanker, rûpeleka mezin ya bi çixêzeka pênc tilîyan li cihekî guncaw dialiqîne. Li ser her tilîyê îfadeyên li jêrê (û yên wekî wan) hatine nivîsandin.

Tilîya beranekê: "Min ji vê hez kir" yan jî "Kêfa min pir ji vê ra hat."
Tilîya nîşandekê: "Dixwazim vê bibêjim" yan jî "Dixwazim vê lê zêde bikim"
Tilîya navîn: "Vê gavê herî pir vê dera bedena xwe hîs dikim"
Tilîya gustîlkê: "Vê meraq dikim" yan jî "Dixwazim zêdetir tiştan derheqê vê mijarê da bizanim"
Tilîya qilîçkê: "Ev beş gelekî kurt bû" yan jî "Min dixwest zêdetir wextê xwe bidim vê."

Beşdar li peyv/îfadeyên ku dê valahîyên îfadeyan yên li ser posteran dagirin difikirin. Van îfadeyan li ser kaxezên biçûk yên hatî belavkirin dinivîsin û kaxezan li ser valahîyên eleqedar yên posteran dizeliqînin. Valahîya di heman îfadeyê da, hingê bi peyvên beşdarên cuda dihê dagirtin.

Paşragihandina Pênc Tilîyan çêdibe ku bi awayên cudatir jî bihê pêkanîn:

Hêsanker, rûpeleka mezin ya bi çixêza pênctilîyan li navenda sinifê radixe erdê. Li ser çixêza destê vala îfadeyên li jêr (û yên wekî van) hatine nivîsandin.

Wekî, "Min kêf kir, min xwe ewle hîs kir, min xwe dilbiguman hîs kir, hin tiştan derheqê xwe da hîn bûm, min xwe rehet hîs kir, min xwe nerehet hîs kir, min xwe mişt enerjîk hîs kir, min xwe aram hîs kir, hin tiştan derheqê kesên din da hîn bûm, dixwazim bêhtir hîn bibim, ez jî dixwazim bibim dilxwazê reqsê, dixwazim dilxwazekî din yê reqsê nas bikim, dixwazim reqseka din fêr bibim, dixwazim bi komekê ra bireqisim."

Her beşdarek radihije pênc heb etîketan (sticker) û van di îfadeyên li ser destî hatî nivîsandin da li kêleka 5 hebên li gor xwe dizeliqîne.

Herî dawî, hêsanker beşdaran li dor posterî dicivîne û li gor zêdehîya etîketên li kêleka îfadeyan, çalakî bi awayekî giştî pêk ve dihê nirxandin.

## BERNAMEYA XEMA MIN REQS E

**Fikir û Tetbîqkirin**
Nil Delahaye - BoMoVu
Seda Güney – Terapîsta Reqs û Hereketê
Danny Lundmark – Terapîsta Muzîkê
Berenike Schramm – CABUWAZİ

**Metin**
Nil Delahaye - BoMoVu
Seda Güney – Terapîsta Reqs û Hereketê
Berenike Schramm – CABUWAZİ
Vîdeo, Kamera û Postproduksîyon
Gökce İnce

**Dilxwazê Reqsê**
Salah Baker
Qeyda Muzîkê û Postproduksîyon
Danny Lundmark

**Îlustrasyon**
Mert Tügen

**Dîzayn**
Esra Göksu | www.esragoksu.com

**Koordînasyon û Tetbîqkirin**
Beril Sönmez (Anadolu Kültür)
Birte Neumann (LaKI)
Ekin Su Birinci (Anadolu Kültür)

**www.hep-beraber.org**
**www.alle-zusammen.org**
**www.germanturkishinitiative.org**

**Wergera Kurdî**
Murat Bayram

**HIŞYARÎYA YASAYÎ DERHEQÊ LÎSANS û HEQÊN TELÎFÊ ya BERNAMEYA XEMA MIN REQS E da**

Bernameya Xema Min Reqs e li gor şertên xwarê çêdibe ku bihê jêzêdekirin û belavkirin:

a. Lîstik gava ku bihê bikaranîn, jêzêdekirin û parvekirin, divê kes û saziyên (lîsansorên) navê wan di kunyeyê da wekî  referans bihên nîşandan.

b. Di bikaranîna melzemeyê da divê kunye wekî referans bihê nîşandan, divê bihê dîyarkirin ka guhertin di melzemeyê da hatîye kirin yan na. Agahîyên referansî û guhertinê yên bo kunyeyê, bi şertê ku fambar be, bi her awayê maqûl dikarin bihên dayîn. Lê di dayîna van agahîyan da, divê ew întiba nehê çêkirin ku kes û sazîyên xwedî lîsans piştgirîya we yan jî ya bikaranîna we dike.

c. Bikaranîna ne-ticarî – Bernameya Xema Min Reqs e çênabe ku bi armancên ticarî bihê bikaranîn, jêzêdekirin û belavkirin.

d. Berhema li ser hatî karkirin, çênabe bihê belavkirin -  Bernameya Xema Min Reqs e û melzemeyên di nav qutîya lîstikê da heger ji nû ve bihên sererastkirin, guherandin yan jî rasterast li ser wan bihê karkirin, halê guhertî yê melzemeyê çênabe ku ji alîyê kesên sêyem ve bihê jêzêdekirin, belavkirin yan jî ragihandin.

e. Hikimê îlawe yê astengker çênabe bihê bikaranîn - Çênabe hikimên îlawe yan jî prosedûrên teknîk bihên bikaranîn ku hema tetbîqeka bi destûra lîsansê bi awayekî yasayî li kesekî din qedexe dike.

f. Kes û sazîyên navê wan di kunyeyê da, nikarin van heqên we betal bikin heta ku hûn li gor şertên lîsansê tevbigerin.

Ji bo agahiyên zêdetir, hûn dikarin di ser malpera projeyê ra bi me ra peywendî danin:
www.hep-beraber.org | www.alle-zusammen.org

**Înîsîyatîfa Hevkarîya Elmanya-Tirkîyeyê di Warê Piştgirîya Penaberan da**

Bi hevkarîya

ANADOLU KÜLTÜR

Kommunale Integrationszentren
Landesweite Koordinierungsstelle

Bi piştgirîya

STIFTUNG MERCATOR